# TÊGEHIŞTINÊN (ÎDRAQKIRIN) OSMANÎYAN YÊN DERBARÊ KURDAN, DI DESTANA BEDIRXAN BEGÊ BOTÎ DA

Müslih SEZER
Beşa Ziman û Edebîyata Kurdî- Zanîngeha Bîngolê\ Turkiya

## KURTE:

Helbestvanekî Osmanî bi navê Lîsanî di sala 1847an da bi navê "Destana Bedirxan Begî" helbestekê bi rengê destanê dinivîse. Di wê destanê da têkilîyên Kurd û Osamnîyan xwe didin pêş. Bi çavekî terefdarane serhildana Mîr Bedirxan tê dîtin û teswîr kirin. Osmanîyan bi çi çavekî, bi çi hest û ramanekê serhildan dîtine û bi çi rewşê Kurd mêze kirine, destan van xusûsîyetan dide nîşan. Lîsanî, caran bi çavê desthilatdaran, caran bi yê gel rewşa serhildanê dinêre û caran jî kesayetîyên destanê weke kesên tîyatroyê li hember hev dide axaftin. Bi vê awayê têkilîyên Kurd û Osmanîyan, nêrîn û ramanên wan yên di derbarê hev da derdikevin meydanê.

Serhildana Bedîrxan Begî serhildanekî yekem e ku bi gelekî befirehî temsîliyeta Kurdan dike. Rêvebir û mîrên Kurdan jî xwestine êdî otorîteyekî Kurdan jî hebe û ew jî hakimiyeta erdê xwe biken. Destana Bedîrxan Begî jî, rûpelek ji dîroka Kurdan e û Kurdan çawa serî hildaye, ji bo çi şer kirine û ber xwe dane, tê xwûya kirin. Herçendê destan bi îdraqkirin û bi çavekî terefdarane yên kesên serdest ve jî hatibe nivîsîn, lê dîsa derbarê reng û şêwaza vê bûyera dîrokî da agahiyan dide xwîneran.

**Peyvên Serekî:** *Destan, Begîtîya Cizîrê, Mîrîtîya Cizîrê, Serhildana Bedirxan Begî, Têkilîyên Kurd Û Osmanîyan.*

## DESTPÊK

Metnên edebîyatê di nav civata gelê xwe da şekil digirin û bi goreyî çand, kultur û ramana wê serdemê tên ava kirin. Herçendê ew metin wek belgeyên objektîf jî neyên dîtin lêbelê dîsa bi goreyî heqîqeta rewş û mercên wê serdemê tên nivîsîn. Di wan metnên edebî da; çand, kultur, raman, sîyaset, ekonomî û sosyolojîya gelan tê dîtin. Di metnên edebî da bi taybetî di helbestan da, paşxaneya terîm îmge û mezmûnan heye. Ev metnên edebî rastîyên jîyanê di nav xwe da dihewînin û caran jî şîroveyeke berfireh dixwazin. Destana Bedîrxan Begî Botî jî bi vê termînolojîyê ve metneke giring e. Ji bo çareserkirina pirsgirika Kurdan pêwist e îdraqkirinên di derbarê hev da bên zanîn ku bi goreyî wan nîyetan gav bên avêtin.

Kurdan ji sedsala 15an pa ve di bin hîmayeta Osmaniyan da wek mîrektiyên nîvotonom jiyana xwe berdewam kirine. Piştî ku mîrektiyan bi padîşahê Osmaniyan Yavuz Selîm ra hevpeymanek çêkirin di dîroka kurdan da pêvajoyeke nû destpê kir. Vê



Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

rewşê heta sedsala 19emê bi erênî û neyîniyên xwe ve berdewam kir. Bi tesîra inqilaba reform û ronesansa Rojavayî fikr û bizavên nû derketine meydanê. Fikra neteweperwerî û netewdewletîyê di dinyayê da serdest bû. Tesîra şoreşa Fransî ev fikr û raman bi hêztir kir. Piştî salên 1830-1840an êdî kurdan jî xwestin mîrektîyên xwe azad biken. Mîrektiyên kurdan dîtin ku yekbûnî nebe kurd bi hêz nabin wan jî bi mîrektîyên sereke ra têkilî danîn û hêza xwe kirin yek.

Mîr Bedîrxan, di nav dewleta Osamnîyan da jî, bi xebat û rêveberiya xwe ve derketibû pêş. Di şerê Kavalayî Mehmed Paşayî da, bi piştekîya Osmaniyan ve bal kêşandibû ser xwe. Di bûyera Nasturiyan da jî bala dewletên Rojavayî jî kêşandibû. Ji ber ku Dewleta Osmanîyan êdî bi ber belavbûnê ve diçû, Kurdan jî xwestin wek hemû gelên mayî ew jî serxwebûna xwe îlan bikin. Mîr Bedîrxan ewilê mîrektiya xwe da yekîtî û ji aliyê okonomî û leşkerîyê ve gavên giring avêtin. Bi mîrektîyên weke Hekkarî û Miksê ra hevpayman çêkir. Di dîroka Kurdan da ev xebat karên weke giring têne dîtin. Ji alîyê din ve Osmaniyan jî xwestin di welatên Kurdan da gavên nû bavêjin. Ji navendê desthilatdar şandin nav Kurdan û xwestin êdî dawî li mîrektiyên Kurdan were. Kurdan bertek nîşanî vê fikr û hereketê kirin û serî hildan. Êdî ji wî demê pê ve Kurdistan bû qada şer.

Destana Bedirxan Begî cara yekem bû Kurdan bi berfirehî li hember hêzên mayî serî hildan. Ji Bedîrxan Begî pa ve êdî fikr û hesta netewetiyê di nav Kurdan da belav bû. ji ber vê yekê jî Osmaniyan nexwestin Kurd di bin bandora wan da derkevin û bi hemû hêzên xwe ve êrişê Kurdistanê kirin. Herçendê Bedirxan Beg têkçûbi jî lê hest û fikra netewebûnê li paş xwe ve hiştibû.

## 1. Serhildana Bedirxan Begî

Bedîrxan Beg (1806-1870), mîrê dawî yê mîrîtiya Botan e. Piştî babê wî Ebdullah Xan wefat dike, birayê Bedirxan yê mezin Salih Beg dibe mîrê Botan. Salih Beg mirovekî ehlê tesewifê bûye. Xwe zêde bi dinyayê ve girê nedaye û desthilatdarî teslîmê birayê xwe Bedîrxan Begî kiriye. Di sala 1835an(1) da Bedîrxan Beg dibe mîrê Botan. Di vê serdemê da rewşa Osmaniyan jî nexweş e. Dewleta Osmanî êdî gelekî paş ve ketiye û şev û roj bi çareseriyan digere ku Împeretoriyê ji belavbûnê xelas bike. Bedirxan Beg jî car caran piştevanîya Osmanîyan dike. Yek ji wan jî di serhildana Se’îd Begî da diqewime û ew piştevanîya Osmanîyan dike û Se’îd Beg têk diçe. Osmanî di dewra Tanzîmatê de tenzîmên nû bi taybetî di eskerîyê da çêdikin û yek jî “Teşkîlata Asakîrê Redîfeyê” ye û Bedîrxan Beg jî bi rutbeya mîralayîyê ve, qomutanekî vê alayê ye (Malmîsanij, 2009:60). Bedirxan Beg, di nav mîr û begên Kurdan da xweyî cihekî giring e. Wî otorîteya xwe li Botanê da tesîs kiribû û sînorên mîrîtîya wî gihabû qadekî bilind. Otorîte û nufûza wî heta Musul, Şengal/Sîncar, Wêranşer, Sîwerek, Dîyarbekir, Sêrt, Wan, Şîno, Ûrmîye, Mehabad, Rewandizê belav bibû. (Mînorsky û yd., 2004:12)

Piştê ku Yunanî jî ji dewletê vediqetin êdî bi gelemperî miletê misliman tenê dimînin. Padîşah Mehmûdê Sanî (II. Mahhmûd), herêmên otonom û xweyî muxtariyet ji meydanê radike û bi merkezê ve girê dide kû êdî ji împeretorîyê veqetîn çênebin. Sultan Mahmûdê Sanî, dema “Ocaxa Yenîçeriyan” ji meydanê radike, dixwaze artêşekî xurt ava bike û di nav vê artêşê da cih bide şervanên Kurd jî. Kurdan jî ev yek qebûl



Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

nedikirin û car caran li ber tenzîman serî hildidan. Yek ji wan jî serhildana Se'îd Begî ye. Ew li hember Osmaniyan serî hildide, Bedirxan Beg alikariya Osmaniyan dike û ew tê hêsîrkirin. Bedirxan Begî jî dixwast, mîrîtiyên derdora xwe têk bibe û otorîteya xwe berfireh bike. Ji ber vê yekê gavên cuda diavêtin û ev jî bala Osmaniyan dikêşa. 1839an de Bedîrxan Beg, bi nîzikê sed hezar leşkerên xwe ve piştgirî da Îbrahîm Paşa (kurê waliyê Misrê Kawalayî Mehmet Paşa) li hemberê Osmaniyan şer kir. Di sala 1839ê, di şerê Nîzîpê de artêşa Osmanî têk diçe û nîzikê 30-40 hezar leşkerên Bedîrxan Begî jî tên kuştin. Piştî têkçûna Osmanîyan ya di şerê Nîzîpê, otorîteya Dewleta Osmanî da di herêmê û derdorê wê da valahîyeke desthilatdarîyê çêdibe û Bedîrxan Beg jî ji vê valahîyê îstîfade dike. Dema ku tenzîma Fermana Tenzîmatê ya di derbarê teqsîmata mûlkî da jî hêdî hêdî tê tetbîqkirin û Cizîra Botan(2) ji wilayeta Dîyarbekirê tê veqetandin û bi wilayeta Musûlê ve tê girêdan.(3) Bedîrxan Beg jî van veguherîna ji bo dahatûya xwe baş nabîne û çareserîyan ji xwe ra digere. Nerazîbûna xwe tîne der û ji walîyê Eyaleta Dîyarbekirê Wecîhî Paşa re nameyekî bi mohrkirî bi birayê xwe Salih Beg û katibê xwe ve dişîne ku Wecîhî Paşa, ji Sedaretê ra nameyan bişîne kû wî û Babêalîyê bi hev bîne. (Doğan, 2010:23)

Piştê têkçûna Dewleta Osmanîya şerê Nîzîpê û girêdana îdara ya Cizîrê ku Musûlê ve hate girêdan, Bedîrxan Beg, têkiliyên xwe bi dewleta Osmanî re dibire û wek mîreke serbixwe hereket dike. Xutbeyê li ser navê xwe dide xwendin û îmametîya Botanê jî dike. (Doğan, 2010: 15-38). Li Cizîrê fabrîqeya sîlah û lewazimatên wê didamezrîne, li ser navê mîrîtîya xwe pere û sîkkeyan darb dike û li ser pereyê "Bedîrxan Mîrê Botan" dide nivîsandin. (Zekî Beg, 2010: 220; Wadie Jwadieh, 2004:140, veguhastin ji Bilêç Şîrkû.) Rewşa xwe ya Kurdistanê xurt dike, têkilîyên xwe bi mîr û begên Kurdan ra xweş dike û li hember Dewleta Osmanî "îttîfaqekê pîroz" li dar dixe. Di nêv vê îttîfaqê de Mustafa Beg, Derwêş Beg, Mehmûxan Begê Muksî, mîrê Hekkarîyê Nurullah Beg, ji yek reîsên herêma Colemêrgê Fettah Beg, yek ji reîsên Hîzanê Xalid Beg, yek ji reîsê herêma Muşê Şerîf Beg, yek ji reîsên herêma Qers û Acarê Kor Huseyîn Bey hebûn. Mîrê Erdelanê jî di nav vê yekîtîyê da cihê xwe digire û Bedîrxan Beg dixwest alim û şêxên kurdan jî di nav vê îttîfaqê da cihê xwe bigirin û ji ber vê yekê jî ji alimê weke Şêx Muhemmedê Musulî, Şêx Yusûfê Zaxoyî re jî xeber şandibû. (Bleç Şêrko, veguhastin ji Malmisanij, 2009:62). Xebat û serkeftinên Bedîrxan Beg bala desthilatdar û walîyên Dewleta Osmanî dikêşe û dixwazin hişyarîyeke bidine Bedîrxan Begî. Bi van xwestinan ra jî hinek firset jî dikevin destê desthilatdaran ku ji xwe ra ji bo ji holê rakirina Bedîrxan Begî, bikin bahane. Di 3yê Cohtmeha 1839an da Fermana Tenzîmatê bi xwestina Dewletên Rojavayî hatibû îlan kirin. Xaleke giring yê vê îlanê jî ew bû ku "can, 'irz û namûsa Misliman, Xrîstîyan û yên hemû teba'ayê Dewleta Osmanî, di bin garantîya dewletê de ye". Şerê Bedirxan Beg û yên Nestûrîyan qewimî bû û gelek Nestûrî hatibûn kuştin. Ev yek ji alîyê Dewletên Rojavayî ve bibû gazind û gilî. Ji Dewleta Osmanî dixwestin ew dest biavêje vê şerê û çareserîyekê ava bike. Balyozê Ingîlîz û yê Fransayê li Stenbolê daxûyanîyekê didene Babêalîyê û sedrezem Reşîd Paşayê Mezin dixwaze Bedîrxan bête Stenbolê ku ew ji wî xelas bibin. Ewilê bi nesîhet û xeberdanê dixwazin wî bînin rê. Ewilê dest diavêjin xerakirina îttîfaqa Kurdan û wê îttîfaqê xerabikin. Ji xwe Mûşîrê Artêşa 'Erebistanê Namik Paşa, bi raporên xwe ve hişyarî dabû Sadaretê ku Bedîrxan Beg bawerîyê nade dewletê û wek



Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

xayînekî hereket dike û pêwist e ji Cizîrê bê dûrxistin.(4) Ji ber vê yekê, Sedaret ewilê dixwaze bi nesîhetan Bedîrxan Begî bînite rê. Mûşîr Osman Paşa, li cihê Ferîk Îsmaîl Paşa de, dibe serbazê Artêşa Anadoluyê. (BOA, İ.MSM, 49/1252, Lef: 3; BOA, İ.MSM, 50/1267, veguhastin ji Doğan, 2010:26). Mûşîr Osman Paşa ewilê dixwaze yekîtîya Kurdan xera bike û beg û mîrên Kurdan ber bi dewletê ve bikêşe û Bedîrxan Begî bi tenê serê xwe bihêle, bi ûnvan û hedîyeyan dest pê vê karê dike. Bi vê xebatê rayedarên dewletê bi Şerîf Begê Muşî, Xan Ebdal, Nurûllah Begê Hekkarî û Izzeddîn Şîr Begê ra dikevine îrtîbatê. Bi vê awayê ev beg û mîrên henê, ji îttîfaqa Bedîrxan Begî vediqetin û xwe didin milê dewletê. (BOA, A.MKT.MHM, 2/103, Lef: 3, veguhastin ji Doğan). Ji alîyekê ve Babêalî ji bo êrişeke eskerî hem amadekarîyan dike, hem jî ji bo çareserîyeke aşitîyane çareserîyan digere. Dewlet dixwaze ji şêx, mela û alimên Kurdan îstîfade bike. Walîyê Dîyarbekirê Hayreddîn Paşa bi şêxên Neqşibendîyan yên Cizîrê re dikeve têkilîyê. Di 25 Nîsan 1847an de ji Şêx Yusûf(5), Şêx Îbrahîm û Şêx ‘Ezraîl Efendî re nameyekê dişîne. Walî Hayreddîn Efendî dibêje; ez jî ji murîdekî terîqeta Xalidîye ya Neqşibendîyê me û ‘îcazeta xwe ya terîqetê jî, ji wan re dişîne. Ji ber biratîya hemtarîqetîyê, Walî dixwaze ev şêx ji Bedîrxan Begî re nesîhet bikin ku li Dewleta Osmanî serî hilnede û serê xwe li ber otorîteya dewletê bitewîne. Hayreddîn Paşa, Derse’adetê re nivîsîye ku şêxên Cizîrê şîretên wî pejirandine û desteka xwe ji Bedîrxan Begî birîne. (Hakan, 2011:197; BOA, İ.MSM, 50/1266, Lef: 2, veguhastin ji Doğan, 2010:).

Derse’adetê xwestîye heta dawîyê Bedîrxan Begî bînite rê û vê carê ji bo îknakirin, temînkirina can, milk û malê wî, ji bo hînbûna fikr û meqseda wî, ji Stenbolê ji erkanê dewletê Nazim Efendîyê dişînin bal Bedîrxan Begî. Bedîrxan Beg û Nazmî Efendî li Cizîrê bi hev ra rudinin û di muzakereyê da li ser hinek xalan li hev tên (Hakan, 2011:195-196). Ew qas muzakere û şîret fayde nadin û bi raporên walî û katiban jî tê qebûlkirin ku Bedîrxan Beg di nîyeteke cuda de ye, bawerîyê nade dewletê û dixwaze hukûmranîya xwe li Cizîra Botan damezrîne. Şertên ku Bedîrxan Begî jî qebûlkirî wek ji bo serhildanê wek zeman qezenckirin û xapandina dewletê dihesibînin û êdî dixwazin tedbîrên leşkerî yê hişk û berfireh bînin cih.

Bedîrxan Begî jî tedbîrên xwe dîtibûn û bi desteka mîrên Kurdan ji xwe bawer bû. îhtîmalek hebû ku têk biçe jî, ji ber vê yekê şeyhulîslamê xwe Şêx Evdilhalûqî dişîne li bal hakimê Urmîyê Yehya Xan ku destekê bide wî û dema ji ber Osmanîyan bireve û îltîcayê wan bike, wî li Urmîyê bihewînin. Lêbelê di navbera rayedarên Osmanî û Îranîyan da lihevhatinek hatibû îmzekirin ku yê li ber wan bireve paş ve teslîm bikin û ji ber vê yekê jî Yehya Xanî soza alîkarîyê nade Şêx Evdilhalûq. (BOA, HR.MKT, Lef: 2, veguhastin ji Doğan, 2010:29; Hakan, 2011:216-217.)

Dewleta Osmanî, di sala 1847an di meha hezîranê, de bi serdariya Mûşîr Osman Paşa û bi arîkariya Omer Paşa û Sebrî Paşa, artêşekî gelek mezin ku ji sih hezar esker, panzdeh hezar mîlîs û bi nîzikê çil topan ve, dişîne ser Bedîrxan Beg. Orduya çaremin ya Osmaniyan bi tevahî êrişê Bedîrxan Begî dikin. (Celîl, XIX Yüzyıl Osmanlı İmparatorluğuna Kürtler; veguhastin ji Malmîsanij, 2009:64). Herdû artêş nîzikê Urmiyeyê rastê hev tên. Bedîrxan Beg ser dikeve, lêbelê eqreba û serbazê wî Mîr Îzeddîn Şîr, sefa xwe veduguherîne û destekê dide artêşa Osmaniyan. Artêşa Osmanî Cizîrê îşxal dike, lê Bedirxan Beg dîsa wan ji Cizîrê derdixe. Artêşa Osmanî demek şûn da ji bo êrişekî paş ve vedigere û Bedirxan Beg bi leşkerên xwe ve vedikêşe Kelha Ewraxê.

Mîrê Miksê Mahmûd Xan, xwe amade dike ku bêçe hewara Bedîrxan Begî û ji Wanê sê hezar mîlîsan berhev dike û berê xwe dide Cizîrê. Lê belê li Tîlloyê pêşiya leşkerên wî digirin. Mahmud Xan bi yekîneya Emîn Paşa re şer dike. (BOA, İ.MSM, 50/1272, Lef: 2, veguhastin ji Doğan.) Artêşa Osmanî gelek şervanên Êzidî jî dikêşe nav xwe(6) û di cihê ku çemê Botan û çemê Dîcleyê digehine hev da, Mahmûdxan li hemberê leşkerên Osmanî tê û şer çêdibe û Mahmud Xan têk diçe. Muttefîkê Bedîrxan Begî Mahmûd Xan, 4 Temmûz 1847an de li Tetwanê teslîmê Ferîk Ahmed Paşa dibe. (BOA, AD, nr. 609, s. 33, veguhestin ji Doğan.) Piştê gelek îşkenceyan Mahmûdxan(7) tê îdam kirin.(8) Bedirxan Beg jî, ewilê vedikêşe Dergulê û vê derê ewle nabîne û bi 4-5 hezar eskerên xwe ve vedikêşe kelha Ewraxê (1847), lê belê xwarên û cephaneyên wan roj bi roj kêm dibe û di dawiyê da bi aşitiyê razî dibe. 27ê Hezîrana 1847an da keleha Ewraxê ji alîyê artêşa Osmanî ve bi sê milan ve tê dorpêçkirin. Mûşîr Osman Paşa, Sebrî, Omer û Mustafa Paşa derdorê kelhê dorpêç dikin û nameya Sedrezem Reşîd Paşayê Mezin ji Bedîrxan Begî re dişînin ku ew bi amannameya sedrezem teslîm bibê û bête Stenbolê, tê bê ‘efû kirin, halel nayê can, mal û malbata wî. Bedîrxan Beg nîzikê heşt mehan berxwe dide lê dawîyê da bi şert û soza lihevhatineke bi şerefane û heysîyetane, Bedîrxan Beg teslîm dibe. Bedîrxan Beg, birayê wî yê mezin Salih Beg, birayê wî yê piçûk Es’ed û bi malbata xwe ve surgûnê Stenbolê dibin û di 19ê Îlonê 1947an da digehijine Stenbolê. (Wadie Jwadieh, 2004:141; Malmisanîj, 2009:66-67.) Paşê surgûnê Girava Gîrîtê dikin.(9) Deh salan Gîrîtê dimîne û paşê tê efûkirin diçe Stenbolê. Bedîrxan Beg dixwaze ber bi Kurdistanê ve biçe û di dawiya umrê xwe wan deran carek din bibîne. Ev daxwaza wî nayê cih. Berê xwe dide rojhilatê û diçe Şamê li wê derê wefat dike.(10) Piştê têkçûna serhildanê, sadaret dest pê tetbîqkirina xalên nîzamnameya Tanzîmatê ya teqsîmata îdarî dike. Mustafa Paşa, ji bo xalên tetbîqkirinê yê Fermana Tenzîmatê, dibe qaymeqamê sancaxa Wanê. (BOA, İ.MSM, 50/1284, Lef: 7-10; BOA, İ.MSM, 50/1281, Lef: 5, veguhastin ji Doğan.). Piştî surgûna Bedîrxan Begî, Izzeddîn Şîr Beg, di sencaxa Cizîrê da wek mutesellîm tê te’yîn kirin.(11) Mûşîrê Artêşa Anadoluyê Osman Paşa, Mîrlîva Emîn Paşayîyê, bi demdorî wek qeymeqamê Cizîrê te’yîn dike. Bi vî awayî Îzzeddîn Şîr Beg, sancaxa Cîzreyê, li ser navê Emîn Paşa, bi wekaleten birêve dibe (Öğün, 2010:55-56). Piştî çend salan Izzeddîn Beg jî serî hildide û têk diçe. Wî û bi malbata wî ve dibine Musûlê. Li bin garantorîya dewletên Ingilîz û Fransîyan bi muhafizîya 470 kesan ve êdî ku carekî din van deran nebîne, 4 Îlon 1855an da, ji Musûlê derikeve. Seraskerîya payîtextê, di tarîxa 18 Cotmehê 1855an da bi sadaretê dide zanîn ku Izzeddîn Şîr û kesên bi wî re hatî bi saxlemî hatine teslîm rakirin û paşê bi biryara meclîsa Vala surgûnê Vîdînê dibe. (Öğün, 2010:357). Piştî vî serhildanê, Eyaleta Kurdistanê tê avakirin û waliyê Musulê Esat Muhlîs Paşa dibe waliyê Kurdistanê û Kurdistan weke wilayetekî bi merkezê ve tê girêdan.

## 2. Destana Bedirxan Begî

Serhildana Bedîrxan Begî, hem di nav Osmaniyan da hem di nav Kurdan û ji ber Nasturiyan di nav gelên Rojhilat da jî gelekî deng vedabû. Vî giringiyê dengê xwe gihandibû edebiyatnasan jî û wan jî ev bûyerên qehremanî ji xwe ra kirine berhem, edebiyat/helbest bi vê rengê neqişandine. Hozanekî Tirk bi navê Lîsanî ku di derbarê


Zakho Centre for Kurdish Studies

wî de zêde me'lûmat nîne, li ser bûyera Bedîrxan Begî destanek di sala 1847an de bi Tirkî gotiye û ev heta roja me hatiye. Ev destan ji 48 çarrêzan pêk hatiye.

Di vê destanê da hozan bi çavên desthilatdaran meseleyê dinêre û car caran Mîr Bedirxan Begê mehkûm dike. Bedîrxan Beg, di eslê xwe da poşmaniya xwe nadete der. Ew her dem dibêje ku teqdîra îlahî ew xistiye vê rêyê û wî jî xwe bi vê awayê di nav serhildanê da dîtiye. Bedîrxan Beg, wextê li payîtextê tê darizandin, Mûşîrê Zaptiyê Mehmed Emîn Paşa bi wî re sohbet dike û wan xeberdanan dike jurnal/rapor û piştê surguna Bedîrxan bi destûra padîşah di rojnameya Teqwîmê Weqayiyê da diweşîne. (30 Çiriya Paşîn 1847). Wê da Bedîrxan Beg weha gotiye: "Serhildana me teqdîra îlahî ye, lewra padîşahê me effu, merhamet û şefqeta xwe bi vê wesîleyê tê nîşanê me bidaya…" (Kardam, 2013: 27).

Di serî da behsa serîrakirin û asîbûna Bedîrxan Begî tê kirin ku ew mirovekî asî ye û tê padîşah cezayê vê asîbûnê bidete wî, lewra yê hifza xwe ji padîşah neke ne mumkine ku ew xwe ji xezeba padîşah xelas bike:

Ez bêjim ji we re gelî guhdaran
Ezê beyan bikem cenga Bedîrxan
Kî hifza xwe neketin ji sultan
Tê bikevê belayê nîne îmkan

Ew Kurdê asî, yê Bedlîs û Wanê
Zehmet daye feqîr û fuqarayê
Bi navê Bedîrxan suwariyek bû
Ew bû asî, yek ji mezinê Kurdan

Padîşah xwestiye mîrîtiyên Kurdan bi xwe ve girêbide û bacê ji wan bistîne. Ev yek xweşa Bedîrxan neçûye û bi merdane ev yek redd kiriye. "Bi qena'eta gelek Kurdan, Bedîrxan Beg di nav xanedanekî gelek giring da, kesayetiyekî herî namdar e. Mirovekî cesûr, cazîbedar, dîndar û hêrsdar bûye, di heman demê da bê perwa jî bûye… ew di bîst saliya xwe da, di sala 1820an da bûye desthilatdarê mîrîtiya Botan. Wî îtaetê otorîteya Osmaniyan nekiriye." (Mc Dowall, 200478). Van xusûsiyetan xwebaweriyek daye wî û Bedîrxan Beg qeb xwestin ji Osman Paşa ra xwestiye û meydana şer nîşanê wî daye:

Gotê hey Osman Paşa, Mîr Bedîrxan
Ez nadim te qet leşker û salyan(12)
Dawiyê şer b'kem amade ye meydan
Tu carê nadim te, teslîm nabe Wan
…
Bedîrxan Beg gotê hasilê kelam
Bê şerkirinê teslîm n'bim wesselam
Heq yan tê bide te û yan min encam
Wê demê tê kifş dibe merdê merdan

Di vê serdemê da serê dewleta Osmaniyan bi desthilatdariya Misrê re ketibû belayê (Kawalayî Mehmet Paşa, Îbrahîm Paşa). Dixwestin vê aloziyê çareser bikin paşê dest bavêjin mîrîtiyên Kurdan. Di vê hengamê da Bedîrxan Begê jî ji vê firsetê îstîfade kir û hakîmîyeta xwe li ser mîrîtiyên kurdan da qebûl kirin. Di destanê da jî xuya dike ku Osmaniyan şer xwestiye û êrişê wî kirine. Bedîrxan Beg şerkirina xwe li ber mecbûriyetê dibîne. Bedîrxan Beg hem mîrê Hekkariyê Nurullah beg ra hem jî mîrê Miksê Mahmûdxan ra têkiliyan didane ji bo şer piştevaniya wan dixwaze. Di sala 1840an da, di bin otorîteya Bedîrxan Begê da, şehrên giring yên weke Diyarbekir, sêrt, Şengal, Urmiye, Wêranşar, Musul, Rewandiz, Wan… hebûn.

Bedîrxan Begî: naxwazim ez zulmê
Tu bi xwe jî dizanî vê ehwalê
Leşker gurr e, dirinde û dijwarî
Tê te bavêjin nava Acemîstan

Osman Paşa: Sencaxê daçikînim
Bi çîruskê te bikêşim esmanan
Bê şerkirî bingeha te derînim
Nebe sebep, were neşkîne mêran
Bedîrxan: Yê min nas dike, dizane
Leşkerê'm rêya min de canfeda ne
Xerab bibim Mehmûdxan tê meydan e
Ew e di gelek deveran qehreman

Dewleta Osmanî, di serî da dixwest pirsgirêka Bedîrxan Begî bi rêbazeke aşitiyane çareser bike. Ji ber vê yekê waliyê Diyarbekirê Xeyreddîn Paşa rolek hilda ser milê xwe û giregir û rûsipiyên Neqşebendiyan yên wê herêmê ra (Şêx Salihê Cizîrî, Şêx Îbrahîm Efendî û Şêx Ezraîl Efendî )kete têkiliyê. Name ji wan şêxan re şand ku Bedîrxan Begê îkna biken. Ji ber ku Bedîrxan Beg jî bibû mûrîdekî Neqşebendî, Osmaniyan dixwestin bi destê wan aliman Bedîrxan Begê bînin rê. Lê belê niyeta Bedîrxan Begî tunebû ku teslîm bibe. Osmaniyan jî artêşekî xurt ava kir. Ji Xerpûtê, Rihayê, Musul û Erzerûmê leşker berhevkirin. Artêşekî ku ji 40 hezar neferan pêk dihat ji bo şerê Bedîrxan Begî amade bû. Artêş li bin fermandariya Mûşîr Osman Paşa û Ferîk Omer Paşa(13) de êriş bire ser Bedîxan Beg.

Bedîrxan Beg got, derkeve meydanê
Gotnên sitembar, kar nekir ji canê
Çil hezaran ve seknîme dîwanê
Min li xwe kom kirin suwar û peyan
…



Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

Bedîrxan Beg: Hîvî be, zuhura min
Her teref amade ye mûrura min
Bi leşkeran benda te sekinîme
Wê demê tu bibîne toz û dûman

Şer destpê dike, pêşiya Mehmûxan Beg û Ebdal Xan tê girtin û ew nikarin xwe bigehînin hewara Bedîrxan Begî. Serdarên Osmanî dibînin ku rewş xerabê dîsa dest bi dek û dolaban dikin. Ji xwe re Fredoyekî[(14)] peyda dikin. Biraziyê Bedîrxan Begî, Yezdan şêr tê hilbijartin. Ew serdarekî Bedîrxan Begî bûye û Cizîr diparast. Osman Paşa teklîfa mîrîtiya Cizîrê dike û wî dikêşe nav sefên xwe. Yezdan Şêr, Cizîrê teslîmê Osmaniyan dike. di demekî nîzik da dîsa Bedîxan Cizîrê hildide lêbelê artêşa wî westiyaî ye û nikarê zêde Cizîrê da bimîne û xwe vedikêşe Kelha Ewraxê. (28 Tîrmeh 1847). Bedîrxan Beg bi 500 mirovên xwe ve ber xwe didin û bi "amannameya" Reşîd Paşa li hev tên û teslîm dibe. (28 Tîrmeh 1847). Rêvebirên Osmanî Bedîrxan Begê dibene Stenbolê. Bedîrxan Beg û Mehmûdxan Beg bi hev ra derdikevin huzura Sultan Evdilmecîd û poşmaniya xwe beyan dikin, efuya xwe xwe dixwazin ku qederê ew mehkûmê vê karê kirine û sûncê wan nîne. Paşê jî herdu bi malbatên xwe ve diçine sirgûnê. Bedîrxan Beg, surgûnê Girava Gîrîtê diken. Serdarê artêşê Osman Paşa û yên ku keda wan di vê şerê da çêbûyî, bi "madalyaya Kurdistanê" tên xelatkirin.

Osman Paşa: Were neke minnet
Tu yê bigehijî Stenbolê elbet
Dîsa ferman kire wî şahê dewlet
Tê j'te bipirse zerer û ziyan

Ji Kurdistanê ve hat mîr Bedîrxan
J'asîtanê re daîm dikir rewan
Padîşah emir kir wî bînin heman
Bila bête huzura min ew nadan

Têkiliya wan herdu mîran (Mîr Bedîrxan û Mîr Mehmûdxan) ji Kurdistanê tê birîn û berê Bedîrxan Beg û malbata wî diden Girava Gîrîtê. 31 Çiriya Pêşîn 1847an de Bedîrxan Beg digehijin giravê.[(15)] Mûşîr Osman Paşa, çar roj piştê avakirina Eyaleta Kurdistanê di rojnameya Teqwîmê Weqayî de tê îlankirin (14 Kanûn/Çileya Pêşîn 1948), da, 18 Kanûn/Çileya Pêşîn 1948an da, ji ber nexweşiya kolerayê krîzekî derbas dike û 20 Kanûn/Çileya Pêşîn 1948an da dimire. (Kardam, 2013: 81)

Padîşah emr kir, guh nadim gotnên te
Nefyê Gîrîtê kin n'bînim rûyê te
Ew Kurd bila bi temamî heşr bibe
Bila xewnê de jî nebine wetan
...

Guh biden wesfê min ehbab û yaran
Me ceng b'hev re kir temaşe û seyran
Sal hezar û du sed û şêst sê heman
Lîsanî got, ji we re ev e destan

## 3. Têgehiştinên Osmanîyan Yên Derbarê Kurdan

Nîzikê hezar salan e Kurd û Tirk di vê coxrafyayê da bi hev ra dijîn. Caran îttîfaq çêkirine li hember dijmeneke hevpar şer kirine, caran jî berê çek û sîlahên xwe dane hev bi hev ra şer kirine. Di mezopotamyayê da, Anodoluyê da têkilhev bûne û êdî nekarîne ji hev jî veqetin. Tirkan jî Kurd ji xwe dûr nedîtine û xwestine Kurd jî her daîm bi wan ra bin. Di serdema Mahmûdê Duyem da pergela ademê merkezîyetê dest pê dike û di çarçoveya vê polîtîkayê da bi çareserîyeke eskerî dawî li mîrîtîyê Kurdan tê. Kurd jî li hember vê vegûherînê serî hildidin û dixwazin rayedarên wan ji wan bin. Rayedarên Osmanî jî cihê cezakirina îdamê û yên din da wan surgûnê Stenbolê dike. Bi vê awayê wan payîtextê perwerde dike, wan dikêşe nav sîstemê û bi dewletê ve girê dide. Mîrîtîyên dawîyê yên weke Bedîrxanî û Baban surgunê Stenbolê dibin, zarokên wan li wê derê di mektebên nûjen da perwerde dibin û di nav sîstema rêvebirîyê da wezîfeyên giring hildigirin. Bi vê awayê rayedarên Osmanî xwestine Kurdan entegreyê[16] dewletê bikin. (Yekdeş-Erdem, 2014:330).

Şer û gengeşîyên wan bi saya şa'ir û nivîskaran, cihê xwe di edebîyatê da jî girtîye. Edebîyata Klasîk em danin alîyekî, di edebîyata modern da (Edebîyata Tirkan ya Serdema Tanzîmatê) cara yekem e ku li ser şer û pevçûnên Tirk û Kurdan destanek tê nivîsîn. Herçendê hinek nivîskar dibêjin, di serdema Cumhurîyetê da cara yekem peyva “Kurdî” di şi'ra Tirkî da hatîye bikaranîn[17] jî ev ne rast e. destana Bedîrxan Begî ji piştî salan para xwe ji qedexekirina zimanê Kurdî hilgirtiye û hinek caran aşîkar e ku peyvên “Kurd û Kurdistan ji helbestê hatine derêxistin.[18]

Di edebîyata Tirkan da îmaja Kurdan gelekî baş nîne. Milllet û çandin ku di bin kultura hakim de mayî, îmajeke xirab dikêşin ser xwe. Lêbelê ev xusûsîyet hinekî jî di edebîyata anonîm da weha xuya dike. Berhemên mayî da Kurd, wek milleteke çîlekeş, mazlûm û belengaz tê dîtin.[19] Di destana Bedirxan Begî Botî da jî îmajên Kurdan yên ku Tirkên Osmanî beyan kirine, hinekî jî bi vê rengê tên xwuyakirin.

### 3.1. Hukumranî ya Osmanîyan e

Herçendê xelîfetî bi goreyî meşweretê piştî “Xulefayên Raşidîn” bi dawî bibe jî, lê belê di destê Emewî, Ebbasî, Memlûkî û Osmanîyan da wek amûreke sîyasî her daîm hatîye bikaranîn. Osmanîyan jî ev muessese ji bo hakimîyeta xwe ya li ser dinyayê emilandine. Di sîstema xelîfetîyê da, pêwist e xelîfe/hukumdar bên hilbijartin (bi meşweretê). Bi vê awayê dema hate hilbijartin, hakim û xelîfe ye. Di dînê Îslamê da cudahîya rêvebir û xelîfeyê tune. Xelîfe kî hatibe bijartin desthilatdar/hukumdar jî ew e. Ji bo nîzama xelîfetîyê hukumet tên teessûs kirin. Hingî hukumet emrê bi'l-me'rûfê[20] tetbîq bike, millet îta'etkirina wî ra mukellef e. (Mewdûdî, ?: 35). Lêbelê em dibînin ku ev xusûsîyet nehatîye tebîqkirin û desthilatdaran ev muessese bi goreyî fikr


Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

û ramanên xwe bi kar anîne. Ji ber vê yekê jî, yê ku serî hildane ji xwe ra bahane dîtine û bi goreyî wê hereket kirine. Bedîrxan Begî jî xwe di herêma xwe da weke desthilatdarekî dibîne û ji bo sîstemekî bi goreyî xwe ava bike, serî radike.

Piştî ku Osmanîyan Memlûkî têk birin, xilafetî ji Misrê anîne Stenbolê, li ser navê xelîfetîyê, Osmanîyan meşrûîyetek bi dest xist. Mal û milk yê Xwedê ye û padîşah "zilullah" sîya Xwedê ya li ser erdê ye, bi navê Xwedê hukumranîyê dike. Osmanîyan(21) di serî heta dawîya împeretorîyê xwestine alemê hemû bêxin bin hîmayeta xwe û bibin dewleteke herî berfireh û xurt. Ji bo vê yekê jî her daîm şerkirine û mucadele kirine. 'Erda ku carekê xistine bin hukumranî û hîmayeta xwe, hingê ji wan hatîye nehiştine ji destên wan derkeve.(22)

Di vê destanê da jî şa'ir, şîretan Bedîrxan Begî diket ku xwe ji hifza padîşahî bike. Hukumranî û quwwet û desthilatdarî ya wî ye, di milkê alemê da teserrûfatî di destê padîşah da ye. Pêwiste padîşah çi bibêje tebayê wî bipejirînin û îta'etê bikin.

Bêjim ji we re ey gelî guhdaran
Ezê beyan bikem cenga Bedîrxan
Kî ye hifza xwe neketin ji sultan
Tê bikevê belayê nîne îmkan

## 3.2. Kurd; Eşqîya, Rikegir, Şakî ne

Kurdan jî gelek caran li hember rayedar, zulm û zorbetîyê serî hildane. Di dawîya Osmanîyan da li bin tesîra şoreşa Frensî û millîyetperwerîyê bi dehan serhildanên kurdan jî çêbûne. Ji ber van serhildanan êdî Kurd di nav Dewleta Osmanî da wek eşqîya, şakî hatine dîtin. Herwekî mîrê Hekkarîyê Nurullah Beg; mîrên Muksê Mahmud Xan, Derwêş Beg, piştî fetihkirina keleha Xoşabê di çavên dewletê da wek "habis, eşqîya, fesad" tên dîtin. (Hakan, 2011:127-128). Herçendê Kurd, weke milleteke cudaxwaz hatibe dîtin jî di çavên rayedarên dewletê da lêbelê daxwaza Kurdan ji cûdaxwazîyê dûr bû. lewra Seyyîd Ebdulqadîr dijê Şerîf Paşa û Bogos Nûbar derdikeve ku em dijberê dewleteke serbixe yê Kurdan e. (Göldaş, 1991:282).

Bedîrxan Beg jî dema şerê "Çemê Zeytûnê" da serdikeve, Ingilîz dixwazin alîkarîya wî bikin. Eger ew hîmayeta wan qebûl bike ji bo hukumeteke Kurd a serbixwe, tê alîkarîya wî bikin. Lêbelê ji ber hestên bawerîyê Bedîrxan Begî ev daxwaz paş ve vegerandîye. (Alakom, 2009:89)

Şa'ir Lîsanî jî di bin vê hişmendîyê da Kurdan asî, zalim û şerker dibîne. Bedîrxan Beg bi mîr û begên Kurdan yên derdora xwe ra îttîfaqekî çêdike. Bedîrxan Begî sînorên hakîmîyet xwe berfireh dike dixwaze serî hilde. Ev jî wek şakîtîyê tê hesibandin. Şerê Bedîrxan Beg û yên Nesturîyan gelekî deng vedabû. Ingilîz û Fransîyan dixwestin, Dersa'adet, Bedîrxan Begî terbîye û ceza bike ku wî li ser Nasturîyên Xrîstîyan hukumranîyek ava kiriye wan dikuje û mal û milkê wan talan dike.

Ew Kurdê asî yê Bidlîs û Wanê

Zehmet daye feqîr û fuqarayê

Bi navê Bedîrxan mêrek suwarî

Ew bû asî ji ekabîrê Kurdan

Kurd heta demeke nîzik, bi gelemperî gundan da dijîyan û milleteke koçer in. Ev jî wek xusûsîyeteke Kurdan hatîye dîtin. Ev koçerbûn pêşîya burjûvazî ûperwerdehîya wan girtîye, ji wan ra bûye asteng ku neteweperwerîyeke xurt û enternasyonal derkeve meydanê. Di rêzên jêr da jî tê xwûyakirin ku Mîr Bedîrxan wek gavanekî paşdemayî tê dîtin û bi vê awayê wî piçûk dibîne. Li alîyê din jî Osmanî, di teknolojî da ew qas pêş ketine êdî bi erebeyan diçine nîçîrê.

Osman Paşa: Hey gavanê garanê

Ji gotinên pûç û vala nabim guhdar

Te ne bihîstiye mesela navdar

Osmanî digre kêrbûşkan b'erebê

## 3.3. Kurd Cesûr û Qehreman in

Xusûsîyeteke Kurdan yê sereke cesûrbûn û qehremanîya wan e. Ew xusûsîyet, ji terefê Tirk, 'Ereb û Farisan ve jî hatîye pejirandin. Di nav dewleta Osmanîyan da fedakarî û qehremanîya xwe, bi zêdahî dane nîşan. Mesela, dema dewleta Osmanî di şerê Nîzîpê da li hember Îbrahîm Paşa dikevine zorê, Bedîrxan Beg bi leşkerên xwe ve diçite alîkarîya wan û di vê şerê da, nîzikê sî hezar leşkerên Bedîrxan Begî tên kuştin.

Di dawîya Dewleta Osmanîyan da, di têkoşîna neteweparêzbûnê da, neteweperwerên Kurd ji ber nexwestibûna veqetandina ji împeretorîyê, ji gelên din cuda dibûn. Kurdan her daîm jîyana xwe bi Tirkan ra didîtin û lêbelê wek xweyî muxtarîyet yan jî wek sîstemeke federatîf, dixwestin ji xwe ra sîstemeke ava bikin. Fikra hereketên millîyetperwerîyê yên nêv Împeretorîya Osmanî da, bi taybetî yên Rûm û Arnavudan bi îdealekî dewleteke serbixe ve girêdayî bû. Lê daxwazên rewşenbîr û bûrokratên Kurdan, sînorên kulturî û neteweperwerîyê derbaz nedibûn. Li 'dijê mîllîyetperwerîyê yên di dewleta Osmanî yên serdema derengmayînê da, mîllîyetperwerîya Kurdan, ji belavbûna împaratorîyê re wek bertekeke derketibû meydanê. (Yekdeş û Erdem, 2014:329-330). Herçendê di hişmendîya Tirkan da, Kurd wek cudaxwaz, xayîn, nankor… bêne dîtîn jî, lê Kurdan wezîfeya biratîyê zêdehî bi wan re kirîye û ev jî xweyî bextbûn, fedakarî û qehremanîya wan dide nîşan.

Bedîrhan Beg got ev e mirazê min

Ji xwe şer kirine xwestin û we'dê min

Ma qey te nebihistiye qet navê min

Ji çi cesaretê tu hatî li vê rexê min



Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

Bedîrxan Beg got naxwûm zaxê çaman
Kurd im padşah ra dikim şerê giran
Top, tifingan nas nake kurê Kurdan
Dema bigre destê xwe şûr û qelqan

## 3.4. Kurd Bacê Nadin û Serî Natewînin

Têkilîyên Stenbolê (Osmanî) û yên prensên (mîr, beg) Kurdan ji mukemmelîyê dur bû. Sîstema nîv-prensîtîyê heta sedsala 19emê berdewam kirîye. Ji ber vê yekê jî mirov nikare rêvebirîya mîrîtîyan wek pergeleke serkeftî a sîyasî binirxîne. Prensîtîya Kurdan ên weke sencaxan da, rêvebirî ji bavê derbasê kurê dibû û gelekê wan ji bac û salyanê mu’af bûn. Di sedsala 19emê da dema rêvebirên Osmanîyan xwestin sîstemê vegûherûnin û ji Kurdan bacê hilgirin û wan bêxin nav eskerîya mecbûrî, Kurdan bertek[23] nîşan dan û dijê vê vegûherînê sekînin (McDowall, 2004:59).

Xusûsîyeteke Kurdan jî ew e ku li hember zilm û zordarîyê tu carî serî natewînin. Ev ji qehremanî û şece’eta wan tê û me pêşîyê da di derbarê vê da nimûne dabûn. Kurd di muhafezekirina can, mal û namûsa xwe de pir hessas in. Em dikarin van xalan wek sînorên wan yên sor bidin nîşan. Li ber van nîrxan da bizane tê canê wî jî here gavê paş ve navê je û cesareta xwe naşkîne. Di rêzên jêr da jî xwûya dike ku Bedîrxan Beg, bac dayîn û daxilbûna eskerîyê û kirina ‘eskerîya mecbûrî napejirîne. Mîrên Kurdan yên mayî jî piştevanîya wî dikin erdên xwe jî bernadin û teslîmê wan nakin. Ji wan ra qeba meydanê dixwaze. Bedîrxan Begî, ji mîrîtîya xwe ra artêşeke xurt jî avakirîye û ji bo sîlah û lewazimatên leşkeran jî fabrîqeyeke sîlahan di Cizîrê da ava kiriye. artêşeke xurt e lewra li hember çil û pênç hezar leşkerên Osmanî wî panzdeh hezar leşker kom kirine û ev sînorên mîrîtîya bigrine ber çavan serkeftineke mezin e.

Gotê hey Osman Paşa, Mîr Bedîrxan
Ez nadim te qet leşker û salyan
Dawiyê şer b’kem amade ye meydan
Tu carê nadim te, teslîm nabe Wan

## Encam

Serhildana Bedîrxan Begî serhildanekî yekem e ku bi gelekî befirehî temsîliyeta Kurdan dike. Rêvebir û mîrên Kurdan jî xwestine êdî otorîteyeke weke muxtarîyetê yê Kurdan jî hebe û ew jî hakimiyeta erdê xwe biken. Destan li ser qehremaniya Mûşîr Osman Paşa û mîrê Botan Bedîrxan Begî radiweste. Destana Bedîrxan Begî rûpelek ji dîroka Kurdan e û Kurdan çawa serî hildane, ji bo çi şer kirine û ber xwe dane, tê xwûya kirin. Herçendê destan bi çavekî terefê serdest ve jî hatibe nivîsîn lê dîsa derbarê vê reng û şêwaza vê bûyera dîrokî da agahiyan dide xwîneran.

Di sedsala 19. da serhildanên li hember Dewleta Osmanî derketî (Serhildana Moroyê, Yunanîstanê), serhildana Waliyê Misrê Mehmet Alî Paşa û kurê wî Îbarhîm Paşa… hêviyek dabû Kurdan jî ku Kurdistanê da ji xwe ra otorîteyekî damezrînin. Mîrê Soran Mîr Muhemmedê Rewandizî ji bi serhildan û serkeftiyên xwe ve ji Bedîrxan Begî re bibûne îlham ku ew jî di herêma xwe de xebatekî bike. Bi vê awayê serhildan destpê dike lêbelê ji ber gelek sedeman bi ser nakeve û têk diçe.

Giringiya vê destanê û serhildana Bedîrxan Begî, em dikarin bi van xalan da bidene nîşan:

- Destana Bedîrxan Begî, di derbarê vê bûyera dîrokî giring da hinek heqîqetan ku ew nîşanê me dide ku carek din dîrok neyê dûbarekirin. Lewra yekîtîya Kurdan çênebe nikarên wek geleke serbixwe xwe heyî bikin.
- Destanê da rengê serhildanê kifşe dibe ku insanan ji bo çi bi çi awayê, bi çi nêrînê şer kirine, ji bo ku îqtîdar neyê parve kirin çawa li ser heq û edaletê firdane çûne bi şiklekî edebî hatiye vegotin.
- Ya giring jî ew e ku têkilîyê Kurdan û Tirkan di vê destanê da xwe didin der. Di vê serdema derengmayîna neteweperwerîya Kurdan da, têkilîyê Kurdan bi Kurdan ra û têkilîyên wan bi Tirkan ra reng û şêwaza xwe dide nîşan. Împeretorîya Osmanî ji cure cure milletan pêk dihat. Lêbelê têkilîya Kurdan û Tirkan hinekî ji yên mayî cudatir bû. kurdan nedixwestin bi temamî ji Tirkan veqetin û Tirkan bi tu awayê destûr nedida û zemîn bi vê hestê ra amade nedikir.
- Serdema Tanzîmatê em dibînin ku Kurdên Stenbolê dixwazin Kurd, di Kurdistanê da ji xwe ra muxtarîyetekê an jî federasyoneke ava bikin. Herwekî reîsê Şûraya Dewletê û reîsê Cemîyeta Bilindkirina Kurdan (Kürt Te'alî Cemîyetî) û kurê Şêx Ubeydullah, Seyyîd 'Abdulqadîr li ser fikra Osmanî bû di nav sînorên dewletê da federasyonek ji Kurdan ra dixwest. Herwekî dema Bedîrxan Beg jî serî hildide, Ingilîz jê ra dibêjin eger tu bikevî bin hîmayeta me emê pêşerojê da dewleteke Kurd ji te ra ava bikin. Lêbelê Bedîrxan Beg hem terîqeta Xalidîyê ve girêdayî ye hem jî îmana wî destûrt nade ji bilê xelîfeyê serî li ber yeke dîn bitewîne û bikeve bin hîmayeta wî.
- Di destanê da jî tê dîtin ku rayedarên serdest dixwazin Kurd xwedî tu mafan nebin û herdem di bin sih û sîwana wan da bimînin. Îro jî tê dîtin ku kurd parçe parçe bûne û weke Îsmaîl Beşîkçî jî gotî di erdên xwe da xwedî mafên insanî jî



Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

nînin û mafên kêmarîyan jî neda wan û bi ser ra jî heyîna wan hatiye înkar kirin. Pêwist e, dewletên desthilatdar Kurdan wek kole û gelekê bindest nebînin û di rêveberiyê da wan jî wek Kurd bikin şirîkê xwe û bi vê awayê jîyaneke nû damezrînin.

- Bila bê zanîn ku fikr û hestên desthilatdaran yên di derbarê Kurdan da çi ne û bi goreyî wê ew jî gavan bavêjin û xwe bi hemî xeml û neqşên xwe heyî biken.
- Me xwest em têkilîyên Kurd û Tirkan yên serdemeke krîtîk bidene nîşan têgihiştênên Osmanîyan (Tirkan) yên derbarê Kurdan de binirxînin ka di hişmendî û binhişmendîya wan Kurd çawa xûya dikin, bidene zanîn.

## ÇAVKANÎ


1. Ahmed Ramîz (Lütfî), Emîr Bedirhan, BGST Yayınları, İstanbul 2007.
2. Bruinessen, Martin Van (2013). Ağa, Şeyh, Devlet. B. Yalkut (çev.). İstanbul: İletişim Yayınları.
3. Doğan, Cabîr. (2010). Bedirhan Bey İsyanı, Süleyman Demirel Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi Yıl: 2010/2, Sayı:12.
4. Esen, Ahemt Şükrü (1999). Anadolu Destanları. Ankara: T.C. Kültür Bakanlığı Yayınları.
5. Göldaş, İsmail. (1991). Kürdistan Teâlî Cemiyeti. İstanbul: Weşanên Dozê
6. Hakan, Sinan (2011). Osmanlı Arşiv Belgelerinde Kürtler ve Kürt Direnişleri (1817-1867). İstanbul: Doz Yayınları.
7. Izady, Mehrdad R. (2004). Kürtler.İstanbul: Weşanên Dozê.
8. Kardam, Ahmet (2011). Cîzre Botan Beyî Bedîrhan (Direniş ve İsyan Yılları), Ankara: Dipnot Yayınları.
9. ---------------------- (2013). Cîzre Botan Beyî Bedîrhan (Sürgün Yılları), Ankara: Dipnot Yayınları
10. Jwaideh, Wadîe (2004). Kürt Milliyetçiliğinin Tarihi (Kökenleri ve Gelişimi). İ. Çeken ve A. Duman (çev.). İstanbul: İletişim Yayınları.
11. Malmîsanij, Cizre Botanlı Bedirhaniler, Avesta, İstanbul, 2009.
12. Melayê Cizîrî. (2010). Dîwan. (amd. Selman Dilovan). Stenbol: Nûbihar.
13. Mewdûdî. (?). Hilafet ve Saltanat. İstanbul: Hilal Yayınları.
14. Muhammed Emin Zeki Beg (2010). Kürtler ve Kürdistan Tarihi. İstanbul: Nûbihar.
15. Mc Dowall, David. (2004). Modern Kürt Tarihi. N. Domaniç (çev.). İstanbul: Doruk Yayınları.
16. Rohat Alakom, Çağdaş Türk Edebiyatında Kürtler, Avesta, İstanbul 2010.
17. Sînan Hakan, Osmanlı Arşiv Belgelerde Kürtler ve Kürt Direnişleri (1817-1867), Weşanên Dozê, Stenbol 2011.
18. Öğün, Tuncay. (2010). Cizreli İzzeddin Şîr Bey ve İsyanı, Yeditepe Yayaınları, İstanbul
19. Yekdeş, Ömer Faruk- Erdem, Servet. (2014). “Bölücü Bir Edebiyat mı Bölünmüş Bir Edebiyat mı? Geç Osmanlı Dönemi Kürt Edebiyat(lar)ı.” Tanzimat ve Edebiyat: Osmanlı İstanbul’unda Modern Edebî Kültür İçinde. (Ed: Mehmet Fatih Uslu-Fatih Altuğ). İstanbul: türkiye İş Bankası Kültür Yayınları. s. 327-357.

## Perawêz:

(1) Muhammed Emîn Zekî Beg, dibêje Bedîrxan Beg, di sala 1812yan de, di hejdeh salîya xwe da bûye mîrê Cizîra Botan (Muhammed Emîn Zekî Beg, 2010:220).

(2) Hawalîyên Bohtan, Eşnî û Hacê Behramê ji sencaxa Cizîrê têne veqetandin û bi wilayeta Musûlê ve (Cizîr bi gelek qezayên xwe ve girêdayîyê wilayeta Dîyarbekirê bûn.) têne girêdan. (Doğan, 2010: 23)

(3) Dema ku Cizîra Botan bi eyaleta Musûlê ve tê girêdan, walîyê Musûlê Mehmed Paşa, tête Telaferê û ji qezayên weke Botan û Hacî Behram ra mutesellîman dişîne Bedîrxan Beg dizane ku li derdora wî dekûdolap tên leyîstin. Walîyê Musûlê Mehmed Paşa, dixwaze Bedîrxan Beg bête Musûlê û îtaeta wî bike. Lêbelê Bedîrxan Beg bawerîya xwe bi wî nayîne û daweta wî red dike û dizane ku nîyeta Mehmed Paşa ji holê rakirina wî û malbata wî ye. (Doğan, 2010: 23)

(4) Mûşîrê Erzerûmê Esad Paşa jî, 22 Sibat 1846 an da, di derbarê serîhildana Bedîrxan Beg û Mîrên Kurdan ya Wanê de, nameyekê ji Sedaretê ra virê dike. Ji bo ji holê rakirina alozîya navenda Wanê û qezayên wê, ji wan re gelek nesîhet û telkîn hatine kirin lê belê, ahalîyê navenda Wanê Mustafa Beg, Mehmûd Xan, Nurullah Beg û Bedîrxan Beg, bûne muxalîfê Îradeya Senîyyeyê û ji dewletê ra serî hildane. (BOA, İ. MSM, 49/1235, Lef: 6., veguhastin ji Doğan)

(5) Bedîrxan Beg, bi her hal karê nexwestîye Osmanîyan re bikeve têkilîyên aşitîyê û wî xwestîye Osmanî rayedraên xwe ji herêmê vekêşin. Bedîrxan beg, xwestîye Ingilîz ji bo aşitîyê bikevine navbera wî û rayedarên Osmanîyan. Ji ber vê yekêî bi navberîya Şêx Yusûf, şertname û daxwazîyên xwe ji Balyozxaneya Ingilterê ya Musûlê re dişîne û wan di vê derbarê da agahdar dike. Balyozxaneyê şert û daxwaznameyên Bedîrxan Begî bi rêya walîtîya Musûlê, gihandine rayedarên Osmanîyan. Şert û daxwaznameyên Bedîrxan Begî ev in:

a) Balyozxaneya Ingilîstanê bibe kefîl dixwaze biçe Derse'adetê/Stenbolê.
b) Tê dest ji cezayê îdamê û kuştinan berde û tê hêsîran azad bike.
c) Tê Nastûrîyan serbest bihêle û tê wan li hember qanûnê bi Mislimanan re wek hev bibîne.
d) Li ser navê xwe tê xutbeyan nedete xwendin.
e) Tê behra baca xwe bide dewletê.
f) Tê êrişê Nastûrîyan neke û Mar Şamunê wek keşe û serokê wan tê qebûl bike. (Hakan, 2011: 197-198.)

(6) Yek ji sedemên têkçûna Bedîrxan Begî ya giring îxaneta eqrebayê wî Yezdanşêr bû. Yezdanşêr terefê xwe di şerê da vediguhêze û diçe milê artêşa Osmanî û bi vê îxanetê hêza artêşa Bedîrxan Beg ze'îf dibe.

(7) Mustafa Reşît Paşa 10ê Çiriya Pêşîn 1847an da, ji sultan Ebdulmecîd ra tezkereyekî virêdike ku hêj neçûne sirgûniyê destûra wan bide, bi tenê Mehmûdxan û Bedîrxan Beg bêne Babê Aliyê û bi wan re biaxêve. 14ê Çiriya Pêşîn 1847an da îfadeyên Mahmûdxan, birayên wî Ebdurrezaq Beg, Ebdal Xan, Mîr Şemseddîn, Mîr Seyfeddîn, begê Xelatê Mustafa Beg û begê Geliyê Kêsanê Xalid Beg têne girtin. Bi tenê îfadeyên Bedîrxan Beg, Mahmudxan û yên Abdurrezaq Beg têne qeyd kirin. Berê Bedîrxan


Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ لێکۆڵینێن کوردی

Begê diden Girava Gîrîtê û berê Mahmûdxan jî diden Warnayê (Rusçûk). (Kardam,2013:56-58)

(8) Wadie Jwaideh (Kürt Milliyetçiliğinin Tarihi, Kökenleri ve Gelişi), ji Arshak Safrastian vegirtiye (Kurds and Kurdistan. Londra: The Harvill Press, 1948) dibêje Mahmûdxan hatiye îdam kirin. Lê belê ev zanîstekî xelet e. Mahmûdxan li Rusçukê di sirgûnyê da wefat dike. (4 Kanun/Çileyê Pêşîn 1866). Mahmûdxan û birayên xwe tu carê nayêne efûkirin. Gelek caran serî lêdane ku bêne efû kirin û li Stenbolê bêne cihkirin, lêbelê ev daxwaza wan tu carê bi cih nehatiye. (Kardam, 2013: 176; Hakan, 2011:315)

(9) Bi delaleta Reşîd Paşa Bedîrxan Beg diçe huzura Padîşah Abdulmecîd. Padîşah sedemê serîrakirina wî jê dipirse û ew wek bersîv di huzura padîşah Abdulmecîd da rubaîya Xeyyam dixwîne û ev yek xweşa padîşah diçe îkramê digel wî dike û weke mîrekî payebilind wî pêşwazî dike.(Malmîsanij, 2009:70)

“Nakerde gûnah der cîhan kîst begû!
Bî-curk û gûnah çûn tevan zîst egû!
Men bed konem û tu bed mûkafat dehî,
Pes fark-i mîyan-i men û to çîst be-gû!”

Wate:
*“Kî ye di dinyayê da gûneh nekiriye bêje!*
*Bêgûnehî tê çawa jiyan bidome bêje!*
*Min gûneh kiriye û tu xerabiyê bike mûkafat*
*Ferqa mabeyna min û te de çî ye bêje!”*

(10) Qebra Bedîrxan Beg li Şamê li nav gorîstana Salîhiyeyê da ne. Li ser kêla wî wiha hatiye nivîsîn:

“Mîrê Cizîra Botan
Mîr Bedîrxanê Azîzan
Rehmeta Xweda li ser wî
Li ser malbata wî bit. 1286. (z. 1870)

(11) Çend salan piştî şerê Qirimê, li hember Osmanîyan di sala 1853an da serî hilda. Ew jî gelekî ber xwe dide lê bêhêvî textê wî jî di sala 1864an de sernîgûn dibe (Öğün 2010:357,370; Zekî Beg, 2010:224).

(12) Salyan: baca salî

(13) Ferîk Omer Paşa, 2Tîrmeh 1847an de, êrişê dibe li ser mîrê Muksê Mehmûdxan Begî û Mûşîr Osman Paşa jî li ser Diyarbekirê ra berê xwe dide Cizîra Botan.

(14) Fredo kesayetiyekî romana “Bav” ya Mario Puzo ye. Ev roman di sala 1969an da tê weşandin. Ev roman ji terefê Francis Ford Coppola ve wek filmekî sînemayê tê kêşandin. Fredo, mirovekî safik e û agahiyên malbata xwe difiroşe dijmên û îxanetê bira, bab û malbata xwe dike.

(15) Di sala 1856an da li Girava Gîrîtê serhildanek çêdibe û di çewisandina wê da Bedîrxan Beg bi Walî Samî Paşa re rolekî mezin dileyzin. Ji ber vê yekê jê re rutbeya “mîrê mîran” û ûnwana “paşatî”yê tê dayîn. Destûr jê re tê dayîn ku were Stenbolê bi cih bibe. Bi qasî deh salan li giravê dimîne, piştê qetlîama Qendiyeyê ya Gîrîtê (3 Tîrmeh 1858) têtê Stenbolê. (Kardam, 2013:207)

(16) Entegrasyon û asîmîlasyon ji hev cûda ne. Osmanîyan xwestine Kurdan û milletên mayî entegreyê dewletê bikin. Dema ku etnîsîteyên mayî hemû ji împeretorîyê vedikêşin, Komara Nû êdî vê fikrê xeternak dibîne û destpê asîmîlasyonê dike. di entegreyê da millet, dîn, ziman,kultur û kevneşopîya xwe muhafeze dike û dibe endameke kêfxweş û dilşad yê civakê. Li Hollandayê Flamank bi vê rewşê dijîn. (Izady, 2004:209) Asîmîlasyon jî, bi tevahî hêjayên xwe ve înkara milletê ye. Rejîma serdest ya asîmîlîst, dixwaze wî milletê di nav çand û jîyana serdest de tune bike.

(17) Ahmed Hakan Coşkun di nivîseke xwe da dibêje, di şi’ra modern ya Tirkî da kesê ku cara yekem peyva Kurdî bikar anî Îsmet Ozel e. Di salên 1960an da, şi’ra xwe ya bi navê “Kan Kalesi”yê da bikaranîye. (Alakom, 2010: 209).

(18) Di helbesta Tirkî de çend cihan peyvên “Kurd û Kurdistan”ê jê hatine derêxistin. Wek nimune di vê çarrêzê da peyva “Kurd” jê hatîye derêxistin.

Van ile Bitlis’in ol asi /…./

Fakir fukaraya çok zahmet verdi

Bedir Han derler bir atlı vardı

Ol asi /………../ ulu ayânı

(Rêza yekem da “Kürdü” û ya duyem da jî “Kürdistan’ın” cih digre.)

(19) Ataol Behramoğlu, di helbesteke xwe da, behsa mirovên feqîr, belengaz û bêziman dike:

“Elbette heye gotinekê wê, xeberekê wê

Ew jinên Kurd yên çayeke qaçax pêşkêş dikin

Çîya bêziman in, dijwar in

Tê rojek were, daxwaza gotineke wan jî çêbe

Û çîya, û zevîyên tenha dema dest bi peyivînê kir

Êdî venabirin, gotin êdî ya wan e.” (Behramoğlu, 1987:728, veguhastin ji Alakom, 2010:2333)

(20) “Ya ew kesên bawerî anîne! Ji Xweda û peyxemberê Wî re û ji xwedan biryarê ku ji we ne, bo wan jî îta’et bikin.” (Sûretê Nîsa, ayet 59.)

(21) Herçendê di bin banê împeretorîyê da du cure millet hebin jî (milletê Îslam û milletê xeyrê Muslîm), musluman jî ji alîyê etnîkê ve (Ereb, Tirk, Kurd, çerkes…) ji hev cuda cuda bûn.

(22) Ev xusûsîyetê Tirkan yê şerker û şerxwaz, di edebîyatê da jî bûye mezmûn û îmajên giring. Herwekî Melayê Cizîrî jî vê yekê te’yîd dike:

Rustem û Cemşîd û Xalid Hemze yan Şêrê 'Elî

Aferîn ya şehsuwarê Turk û rimbazê 'Ereb



Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

Turkîxûnrêz û xumarê me bi yek xemzeyekê

Zuhdê çil sal e li min zêr û zeber kir ji esas

Geh dil û geh can dibin Turkên te tên

Nakirin yexma û talanê xelet

(Cizîrî, 2014:35/107/125)

(23) Piştî serhildana Bedîrxan Begî tê çewisandin, bêhna rayedarên Dewleta Osmanî fireh dibe, êdî dewlet dixwaze pêşîya van serhildinan bigire û sîstemeke nû ava dike. dixwaze desthilatdar êdî ji merkezê ve bên te'yîn kirin û dixwazin gel eskerîya mecbûrî bike û bac û salyaneyê jî bide. Kurd li hember vê yekê disekinin û bertekên xwe nîşan didin. Mûşîrê dewletê Osman Paşa bi leşkerên xwe ve êrişê dibe ser giregirên Kurdan ku bibin esker û bacê bidine dewletê. Yek ji wan jî li herêma Rihayê Hemê Mûsê û Kinê Mûsê ne. Ev herdu qehreman ber xwe didin naxwazin bacê biden û eskerîya mecbûrî jî bikin. Serhildan û qehremanîya wan herdû kesayetîyan dibe stran û dikeve devê stranbêjan:

"Yêl yêl,

Şûrkêşê deşta Rihayê Kinê Mûsê.

Serê Şarê û Tirkê bûyî bi heyrano.
Yêl, yêl, yêl, yêl,
Girê Sirûcê girkî wê li wêo,
Nifûsçîyê dewletê hate bin konê Hemêo.
Dibê: Hemo, were ser qurêo,
Bikşêne çîtikêo,
Bide baş gukrikê salan û salêo,
Xwe bike taba axa û axelerên di dinêo,
Li xwe nerake fermaneke dewletêo,
Heçî barê hukmatê himlê risês e, barê xweo,
Du xortê Gêtika û Berêz bide eskerîyêo
(......)
(Alakom, 2009:90).



Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەکولینێن کوردی

# الكُرد في المعرفة العثمانية من خلال ملحمة بدرخان بك البوتاني

الملخص:

لقد كتب شاعر عثماني في عام ١٨٤٧ يدعى (لساني) ملحمة شعرية تحت عنوان (ملحمة بدرخان بك)، وقد برزت فيها بشكل واضح مستوى العلاقات الكُردية -العثمانية، ويظهر فيها مدى انحياز الشاعر للدولة العثمانية، فقد تحدث الشاعر بلسان السلطات الرسمية، وفي أحيان أخرى تسود مقومات المسرحية الشعرية على الملحمة إذ تتجادل شخصيات الملحمة فيما بينهم، وعن طريق هذه المجادلة يظهر نظرة العثمانيين والكرد بعضهم للبعض.

تلقي هذه الدراسة الضوء على المعرفة العثمانية تجاه الكُرد من خلال تعاملها مع حركة بدرخان بك والشخصيات الكُردية الذين رافقوه، وعلى حيثيات الحركة الكُردية التي لم تشر إليها المصادر التاريخية.

**الكلمات الدالة:** *الملحمة، الأوضاع السياسية والأدبية، انتفاضة بدرخان بك، العلاقات الكُردية العثمانية.*

## OTTOMAN'S THOUGHT ABOUT OF KURDS İN BEDÎRXAN BEGÊ BOTÎ'S LEGEND

**ABSTRACT:**

An Ottoman poet colled Lîsanî wrote a poem named "The Legend of Bedîrxan Beg" in 1847. The relations of Kurds and Ottoman are seen in this legend. The case is writen and depicted in the favour of Ottomans. The legend was writen about how Ottomans see Mîr Bedîrxan and how they think and feel about Kurds and that rebellion. Lîsanî some times considers and looks at the rebellion with the eye of dominant power. He sometimes considers it by the point of the public. He also sometimes sees it a theatre which the wariors play in it theatrally by speaking to each other. The relations beetwen Ottoman and Kurds can be seen in this way, as well as their vision and thought about one another.

Bedîrxan Beg's rebellion is the first one which represents Kurds in detailed. The governors and leaders of Kurd had wanted an independent outority on their earth. Bedîrxan Beg Legend is a new page of Kurd history which depicts how they rebel and why. Although the legend was writen in the favour of the Ottomans, it tells many things and knowledge about this historical case.

**Keywords:** *Legend, Cizir's Governership Political Case Of Cizir, Bedîrxan Beg Rebellion, The Relation Between Kurd And Ottoman.*

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی